

Cejin û Şahiyan Ji welatê me bar kirine

Rêberê Silfî

Hemû rewşenbîr, nivîskar, hezker û berketiyên zimanê Kurdî dizanin ku roja 21ê Sibatê ji her salê, roja cîhanî a zimanê dayikê ye. Roja hezkirin û aştiyê ye, roja piştevanî û hevgirtina gelan e. Di vê roja pîroz de, çalakvan û mirovhezên cîhanê zend û bendên xwe vedimalin û ji bo parastina ziman, çand û zargotina gel û kêmetewan mil li mil, xebateke hevbeş dikin.

Lê mixabin ku îsal ev roja bi nîşan bi ser gelê Sûriyê de hatiye, ew di rewşeke awarte û pir aloz de dijî, rewşeke wihaye ku hawîr, şînê konê xwe vegirtiye û welat ser û ber reş girêdaye û xwîn digirî!!... Eve nêzîkî salekê ye, gelê Sûriyê bi hemû pêkhatiyên xwe, bi rê, awa û şeweyên aştiyane daxwaza mafên xwe yên rewa di jiyaneke azad û bi rûmet de dike, da ku ew bi destên xwe, çarenûs û pêşeroja xwe destnîşan bike û bibe xwediyê mal, mewdan û semyana welatê xwe, bend û zincîrên koletî û bindestiyê bişikîne!!.

Ji wê rojê vir de, karbidestên dewletê har û dîn bûne, çav di serê wan de sor bûne, rişma tund û tûjiyê berdane, kîn û mirina reş bi ser gel de rijandine, gund û bajar topbaran û kavi kirine, mêr û jin, zar û zêç, pîr û kal bi kêr û singoyan gurandine, û kuştin û kiryarên hovane yên dûrî sinciyên mirovatîyê bi wan re bi kar anîne!!.

Di rewşeke wiha xembar û dilêş de, zimanê Kurdî di roja cejna xwe ya cîhanî de reş girêdaye û ji van kiryar û dîdarên xwîndar, lal û matmayî maye!!..

Sed mixabin ku vê demê, cejin û şahiyên ji welatê me bar kirine, kevokên aştiyê ji tirsî mirinê firiyane dûr çûne, lê, bê gûmane ku piştî tengahiyan ferehî ne û dê asîmanê welatê me sayî bibe, bayê azadî û serfiraziyê dê vê mij û moranê bide ber xwe û dûr bibe. Wê hingê, dê tîrêjên rojê bighine

her bosteke axa welêt.

Zimanê Kurdî, bi dilekî tev derd û xem dibêje: "Bila roja cîhanê a zimanê dayikê li xwişkên min zimanê Erebbî, Siryanî, Ermenî, Tirkî, farisî û hemû zimanên cîhanê pîroz be!".

Dumahîk: Di 114 saliya...

li wîr berhemên xwe çap bikin, hem ji ber qedexbûna ziman û hem ji ber buhayê çapkirinê...

Dawî dibînim ku, weşangeriya me bi qedexebûna zimanê me ve girêdayî ye, pêşketina ziman û weşangeriya Kurdî li BinxetêBi qedexebûna ziman ve girêdayî ye, çendî qedexebûna ku li ser zimanê me heye rabe, wiha wê weşangeriya me bi pêş keve û çendî weşanxaneyê me bi pêşkeve wiha jî wê zimanê me bi pêşkeve.. Di baweriya min de roja dawîya van asteng û arîşeyên ku di pêş weşangeriya kurdî de li Binxetê heye nêzîk dibe, em li hêviya wê rojê ne, ew roj nêzîke, ne dûr e.

Dumahîk; Bawer mekin..

, Ebilhemîd Zîbarî û H.W.D, ku bi hezaran yadê bi destên setemkaran û neyarên azadî hatine kuştin, delala min yadê, bawer bike ku tenê em bi laşê xwe mirîne lê, bi giyanê xwe herdem li rex we ne û bi keser gotinên xwe berdewam dikir û digot : Yadê temî û şîreta min ew e ku , zor girînge Kurd hevdu bipejirînin û ji ya xwe nemînin , rojên li pêş yên me ne yên azadiyê ne ! Yadê ma kî nizane, ku azadî çiqas xweş e ! Hîngê min dikir ,ku kî bi destên wî bigirm û bi dengê bilind hawar û banga xwe li tevan bikim, ku vaye Şêzad nemiriye û namire .Ew li rex me ye, hîn ez di wa destnavê de bûm , dosteke min li milê min dida û digot : Diya Şêzad, serê xwe rake negirî, xwişka delal, va ye hevalên wî hatine . Min dizanî ku, giyanê Şêro, li rex min bû... Wisan jî, bawer bikin min ew dît, gotin û şîretên wî , mîna zengilan xwe li guhên min didin û hê jî ew zengil deng vedidin !!! ?